Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 33
15'ê Feb 2006
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Agehdariyek ji Televîzyona TÎŞK (TISHK TV)

Ji ber pirsgirêkeke teknîkî sibê 16.02.06'an saat 12.00 li gora dema Ewropa televîzyona dest bi weşana xwe ya testê dike.

# DOZ ÇÛ KONSEYA EWLEKARIYÊ

Demeke dûr û dirêj bû gotûbêj û danûstandin li ser bername û xebatên Etomî yên Îranê ji bo bidestxistina çekên Etomî di navbera 3 welatên Ewropayê û hin welatên din yên cîhanê di rojeva siyasî ya cîhanê de bûbû mijara sereke.

Piştî ku di roja 30.01.2006'an ya Zayînî de, her pênc welatên endam yên dayîm ên Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî li ser şandina rapora dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariyê li hev kirin, di civîna endamên Konseya Biryarê ya Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî de ku di rojên 2,3 û 4'ê meha Fevriya sala 2006'an li bajarê Viyen, paytexta welatê Otrîşê pêk hat, pêşniyarbiryara wan 5 welatan û Almanyayê di vê civînê de hate pesend kirin. 27 welatan dengê **ERÊ** dan biryarê, 5 welatan dengê **SIPÎ** dan û 3 welatan jî dengê **NA** dan biryarê.

Di vê derheqê de:

**Beyannameya Deftera Siyasî ya PDK Îranê li dor şandina dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî** **R.2**




**Hunermenda starnabêj, Şehrîbana Kurdî di hevpeyvinekê de bi Agirî re:**

## "EZ REWŞA MUZÎKA KURDÎ NEBAŞ DIBÎNIM"



**Doma hevpeyvînê di rûpela 8-9'an de**

## Agehdariyek ji Televîzyona TÎŞK (TISHK TV)

Em hevwelatî yên birêz haydar dikin ku kanala esmanî ya **TÎŞK (TISHK TV)** ji roja çarşemî, 26'ê Rêbendana 1384 (15.02.2006)'an, bi belavkirina teksteke dê şaşeya xwe bi ser temaşavanan veke.

Ji bo dîtina bernamên **"TISHK TV"**, balê bidin van zaniyariyên jêr:

Satallait: **Hotbird-4**
Frequency: **12692 MHz**
Polarization: **Horizontal**
Symbol Rate: **27500**
FEC: **3/4**

TISHK

### BALKIŞANDIN

Ji ber pirsgirêkeke teknîkî sibê 16.02.06'an saat 12.00 li gora dema Ewropa televîzyona dest bi weşana xwe ya testê dike.

## Beşdariya şanda nûneriya PDK Îranê di civîna salane ya Enternasyonala Sosyalîst li Atîn, paytexta Yûnanê

Di bin dirûşma **Aştî, Demokrasî û hevxemî ji bo hemû xelkê cîhanê li derveyî tixûbên Kulturî,** civîna salane ya Konseya Enternasyonala Sosyalîst di rojên 30-31'ê Janviya 2006'an li Atîn, paytexta Yûnanê hate lidarxistin...

**Di rûpela 3'an de**

www.arsivakurd.org

# Beyannameya Deftera Siyasî ya PDK Îranê li dor şandina dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

**Hevwelatî ên birêz!**
**Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!**

Roja duşemî, bervara 10.11.1384'an ya Rojî, hevberî 30.01.2006'an ya Zayînî, her pênc welatên endam yên dayîm ên Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî li ser şandina rapora dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariyê li hev kirin. Wê lihevkirinê rê xweş kir ji bo vê çendê ku di civîna endamên Konseya Biryarê ya Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî de ku di rojên 2,3 û 4'ê meha Fevriya sala 2006'an li bajarê Viyen, paytexta welatê Otrîşê pêk hat, piştî gotûbêj û danûstandineke kûr û hûr, aqibet biryarnameya pênc welatên endam yên dayîm ên Konseya Ewlekariyê û Almanyayê paş hin destkarî yan bi pesdenda Konseya Biryarê ya **AVEN** gihîşt. Li gorî vê biryarnameyê ku 27 welat ji koma 35 welatên endam, dengê **ERÊ** û 3 welatan dengê **NA** û 5 welatan jî dengê **SIPÎ(bêalî)** jê re dan, rapora dosya Etomî ya Îranê ji Konseya Ewlekariyê re tê şandin. Eva çend sal e ku Yekîtiya Ewropayê û Amerîka ji rêya Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî cehd û hewlê didin ji rêya gotûbêjê li çêkirina çekên Etomî ji aliyê Îranê ve pêşgiriyê bikin. Gelek caran Îranê xuya kiriye ku armanc û merema wê ji bidestxistina teknolojiya Etomî mifah wergirtina aştîxwazane ye ne berhemanîna çekên Etomî, lê lêkolînên bi nepenî, neaşkira û dûr ji zêrevaniya Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî ev şik û gumane di nava civaka cîhanî de xurt kiriye ku Îran rastiyan diveşêre.

Piştevanî ji terorîzmê û girûpên terorîstî, binpêkirina mafên mirovan, serkut û çewisandina hevwelatiyan, maytêkirin di kar û barên welatên deverê di bin dirûşma hinartina Şoreşa Îslamî bo derve û dijberî û neyarî kirin tevî pêvajoya aştiyê di Rojhilata Navîn de, rûçikeke bixof û pirmetirsî bo ser aştiyê ji rejîma Komara Îslamî çê kiriye. Lewra civaka Navneteweyî û nemaze Rojava bi awayekî xurt dijî bidestxistina çekên Etomî ji hêla Îranê ne û li ser vê baweriyê ne ku Îrana xwedî çekên Etomî, aştiya cîhanê bi xurtî dixe tirsê.

Gotûbêj û danûstandinên çend salî yên welatên Birîtaniya, Almanya û Fransayê wekî nûneriya Ewropayê û bi piştgîriya Amerîkayê heta niha nekariye Îranê bîne ser vê rêyê ku civaka Navneteweyî û Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî xatircem û piştrast bike ku bi rastî naxwaze çekên Etomî çê bike. Nemaze piştî bi ser kar hatina Emedînejad û destpêkirina zengînkirina Uraniyûmê, ev guman li cem civaka cîhanî herî xurt û bihêz kiriye.

Her wekî hate gotin, aqibet roja 04.02.2006'an, Civata Biryarê ya Ajansa Vejena Etomî ya Navneteweyî, biryara şandina rapora dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariya RNY da ku di xwe de nîşana nerazîbûn û vêzariya civaka Navneteweyî û bi taybet welatên biryarbidest li dor Îranê ye. Di vê navberê de helwesta welatên Rûsya û Çinê cihê baldanê ye, heya berî lihevkirina Londonê, Îran bi piştgîriya wan du welatane piştrast û dilgerm bû, lê wisan tê xuya kirin ku têkiliyên bazirganiyê û vêc û berjewendiyên aborî ku welatên navhatî û heta Ewropayiyan jî di Îranê de hene, nekariye li hember vê tirsa ku Îrana xwedî çekên Etomî bo ser aştiya cîhanê çê dike, zal be. Di heman demê de ev biryare vê rastiyê dide xuya kirin ku Îran roj li pey rojê di civaka navneteweyî de şermezartir dibe û pitir di perawêzê de tê xistin.

Guman di vê çendê de tune ku her encamek ji sipartina(hinartina) dosya Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bikeve, berpirsiyariya wê dikeve stûyê rejîma dijî gelî û dijî mirovî ya Komara Îslamî, ku bi siyaset û rêzanên xwe yên nezanane û kirîz afirandinê, çarenivîsa xelkê Îranê bi aloziyê re berbirû kiriye û pêşerojeke tarî û ne xuya li benda wan daniye.

Rêya herî jêhatî ji bo serbestbûn di vê rewşa nexweş û dijwar de ku gelên Îranê pê re berbirû bûne, tekoşîna hemûyan ji bo hilweşandina rejîma Komara Îslamî û ser kar anîna sîstem û pergaleke gelî û demokratîk e ku him Îran bikaribe di asta navneteweyî de cihê hêja û kêrhatî yê xwe bidestve bîne û him gelên Îranê bi mafên xwe bigihîjin û bi azadî û serbestî bijîn û him civaka navneteweyî ji tirsa dêvezme ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê serbest bibe.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**05.02.2006**
**16.11.1384**

# Agehdarî li ser komploya nû ya Dezgehên Ewlekarî yên Komara Îslamî

**Ji bo raya giştî**

Malpera ''Baztab''ê di roja 19'ê Rêbendana 1384(08.02.2006)'an de, ji zimanê çavkaniyeke ewlekariyê qala pîlanên hêzên ewlekarî yên Îranê ji bo eşkere kirin û litelikxistina endam û alîgirên hêzên neyar û cudaxwaz û di encam de dawî anîn bi jiyana van girûp û aliyane di vê rewşa nû ya Îranê de kir.

Kakila vê weşanê dide eyan kirin ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê li ber de ye ku sernekevtina xwe di pirsa çekên etomî tevî cîhanê de bike bi hêcetek ji bo girtin û hepsî kirina hejmareke zaf ji xelkê Kurd û neteweyên bindest yên din di Îranê de, bi vê hêcetê ku ew dixwazin di vê rewşa hesas û dijwar de **bi handana Amerîka û Îsraîlê** deverê ne aram û aloz bikin û bişêwînin.

Bi li ber çavgirtina vê ku:

1: Malpera Baztab di bin zêrevaniya Mihsin Rezayî de tê birêvebirin û xwe jî yek ji karbidestên payebilind yê rejîmê ye, hay ji pîlan û komployên rejîma Komara Îslamî heye.

2: Ceribînan di rabihorî de daye eyanê ku her gav rejîm tevî kirîzeke mezin berbirû dibe û jêre nahê çareserkirin, ji bo lêbandina xelkê, dujminê derveyî (Amerîka û Îsraîl) bo zext û givaşên pêtir li ser xelkê bi giştî û bi taybet rojnamevan û azadîxwazan zeq dike.

Bicih e ku ev nûçeyê Malpera ''Baztab''ê weke pîlaneke nû bihê çav lêkirin û tirs vê heye ku hijmarek zaftir ji xelkê mafxwaz yên Kurd û neteweyên din yên Îranê bihên girtin û radestî girtîgehan bikin û nemaze li derveyî welat jî bihên teror kirin. Lewra, em xelkê azadîxwaz yê Kurd û neteweyên din yên Îranê ji vê tirs û xeterê haydar û daxwazê dikin ku hêzên opozîsyona Îranê û Rêxistinên ne hikûmî vê pîlan û kompiloyê kifş û hilweşînin.

Herwiha em daxwazê ji rêxistinên mafê mirov, kom û navendên demokrat û mafperwer û hikûmetên demokrat dikin ku bi zext û givaş xistin bi ser Komara Îslamî ya Îranê pêşî ji birêvebirina vê pîlana rejîmê dijî xelkê azadîxwaz û xortên şoreşvan yên gelên bindest di Îranê de digirin û wan li hemberî êrîşên nû yên desthilatdarên Komara Îslamî bi tenê nehêlin.

**PDK Îranê**
**Deftera Siyasî**
**23.11.1384'ê Rojî**
**22.02.2006'ê Zayînî**

www.arsivakurd.org

# Beşdariya şanda nûneriya PDK Îranê di civîna salaneya Enternasyonala Sosyalîst li Atîn, paytexta Yûnanê

Di gotarekê de ji aliyê nûnerê PDK Îranê ji bo civîna Konseya Enternasyonalta Sosyalîst rojeva Kurdistana Îranê kete ber bas.

Di bin dirûşma **Aştî, Demikrasî û hevxemî ji bo hemû xelkê cîhanê li derveyî tixûbên Kulturî,** civîna salane ya Konseya

Enternasyonala Sosyalîst di rojên 30-31’ê Janviya 2006’an li Atîn, paytexta Yûnanê hate lidarxistin. Di vê civînê de ku nûnerên partî û rêxistinên ser bi Enternasyonalîstê beşdar bûbûn, tevî hilbijartina Corc A Papondryo, Serokê Partiya Sosyalîst ya Yûnanê(PASOK) ji bo serokatiya Enternasyonalê serokê berê yê Enternasyonala Sosyalîst, birêz Antoniyo Bûtêrês seba diyarîkirina wî bo serokatiya Komîsariyaya Bilind ya Koçberên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî(UNCHR) dest ji kar vekişand, aliyên cuda cuda yên wezîfe û pêşdeyiyên peywendîdar bi gotara aştî, demokrasî û hevxemî ji bo hemû xelkê cîhanê li derveyî tixûbên Kulturî ji aliyê çend kesayetiyan ve kete ber bas. Parek din ya karê konferansê pêkhatibû ji bas, gotûbêj û gengeşe li ser rojeva deverên Amerîkaya Latîn, Afrîqa û Rojhilata Navîn li dor pirsa Aştî û Demokrasiyê. Di beşa Rojhilata Navîn de birêz Dr. Xuro Ebdulayî, Berpirsiyarê Têkiliyên Navneteweyî yên PDK Îranê li derveyî welat di gotarekê de rojeva Kurdistana Îranê, siyasetên qirêj yên Ehmedînejad anî ziman û daxwaz ji Enternasyonala Sosyalîst û civaka Navneteweyî kir ku li hember binpêkirina mafên mirovan di Îranê û xasmanî di Kurdistanê de helwesteke micid bigirin.

Hêjayî gotinê ye ku di raporta Serokê Giştî yê Enternasyonala Soyalîst de helwestên Ehmedînejad der barê Îsraîlê û her wisan siyasetên tundrew yên Komara Îslamî ya Îranê dijî mafên mirovan li Îranê û nemaze di Kurdistanê de bi xurtî haiye mehkûm û şermezar kirin.

Di vê raportê de piştgîriya Enternasyonala Sosyalîst ji bo xebata PDK Îranê dubare hate tekezkirin.

**Hevdîtina heyeta PDK Îranê tevî şandên beşdar di civînê de**

Şanda PDK Îranê ya beşdar di civîna salane ya Enternasyonala Sosyalîst li dema du rojên civînê de, hevdîtin û peywendî tevî berpirsên hejmareke zaf ji partiyên beşdar di civînê de, pêk anî, Partiyên ku şanda PDK Îranê tevî wan hevdîtin pêk anîn, pêkhatibûn ji: Partiya Sosyalîst ya Firansayê, Partiya Sosyalîst ya Beljîkayê, Partiya Sosyal Demokrat ya Swêdê, Sosyal Demokratên Fînlandayê, Partiya Kar ya Norwejê ku Wezîrê Derve yê Norwejê yek ji endamên şandê bû, Partiya Xelkê Pakistanê(bi rêveberiya Xatûna Binezîr Boto), Partiyên Sosyal Demokrat yên Japon, Fîlîpîn, û Kirovasiyayê, Federasiyona Kedkarên Dewletên Yekbûyê yên Amerîkayê. Herwisan şanda PDK Îranê di boneyên cur bi cur de karî tevî kesayetiyên siyasî yên Yûnanê û Serok Komarê Yûnanê birêz Costis Stephanpolos û Serok Wezîrê Yûnanê Kostos Karamondlîs hevdîtinê pêk bîne.

Şanda PDK Îranê pêkhatibû ji: brêz Dr. Xusro Ebdulayî Berpirsiyarê Têkiliyên Navneteweyî yê PDK Îranê li derveyî welat, birêz Mecîd Heqî, Berpirsiyarê Têkiliyên Navneteweyî yê PDK Îranê li Fînlandê û birêz Azad Ezîzî, endamê Komîteya PDK Îranê li Yûnanê.

# Deqa axavtina Dr. Xusro Ebdulayî di civîna salane ya Konseya Enternasyonala Sosyalîst

**Serokê hêja!**

**Hevalê rêzdar birêz Corc Papandiryo!**

Ez ji aliyê hevalê hêja kekê Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ve pîrozbahiyê ji te bi boneya hilbijartina te bi serokatiya Enternasyonala Sosyalîst dikim û serkevtinê di erk û kar û xebatên te yên nû sipartî de di rêya armancên bilind û pîroz yên Enternasyonala Sosyalîst de bi hêvî dixwazim.

**Pişikdarên birêz, hevalên xweştivî!**

Dixwazim li ser Îranê ji we re bipeyivim. Ji Îranekê ku 27 sal e rastî rejîmeke tepeserkar û tund û tûj hatiye û îro ku hûn hemû kes dizanin bi gihîştina Ehmedînejad bo binav Serok Komariyê, Îran bi tevahî ketiye bin desthilata baska herî tundrew ya rejîmê û xelkê Îranê jî careke din û tevî qonaxeke nû ji tepeserkirin û tund û tûjiyê berbirû ne. Tepeserkirinê hemû tex û qatên civakê, bi taybet rewşenbîr, rojnamevan, nivîskar,



xwendekar,mamosta û senedîka, jin û çalakvanên mafên mirovan bi xwe re girtine. Hevdem tevî vê serkut û çewisandina giştî, em şahidê meşandina rêyên herî tund û tûj yên tepeserkirinê dijî gelên zulmlêkirî yên Îranê û bi taybet gelê Kurd di Kurdistana Îranê de ne tenê bi guneha wê ku ew(gelên Îranê) xwazyarê bi fermî nasîna mafên mirovî û neteweyî yên xwe di çarçoveya Îranek demokratîk de ne.

**Xûşk û birayên hêja!**

Ji havîna sala borî bi taybet ji meha Janviya 2005'an ve em şahidê kiryar û cinayetên herî hov û nemirovane ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê dijî neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de bûne. Ji wê demê ve heta niha pitir ji 40 kes ji xelkê sivîl yê Kurdistanê bi destên hêzên dijî gelî yên rejîmê ve hatine kuştin û bi sedan kesên din jî hatine dest bi ser kirin û di girtîgeh û çalên reş yên rejîma paremayî a Komara Îslamî di rewş û zirûfek pir dijwar û nemirovane de dijîn.

Ji aliyê din ve jî serbarê ev kirîza ku peywendî bi pirogremên Etomî yên Îranê ve heye, em şahidê helwestên şêtane weke bang ji bo **ji nav birina Îsraîlê li ser xarîteya cîhanê** û bi **çivanok** hesibandina qirkirina Cihûyan, ji aliyê Ehmedînejad ve

www.arsivakurd.org

ne. Bi kurtî desthilata rejîma dîktator, terorîst, binajo û nejadperest a welatê me çi di warê hundirîn û çi di warê derveyî de bi rewşeke dijwar û bixof re berbirû ye. Her çiqas ku civaka navneteweyî û bi taybet welatên Rojavayî ku di rastî de li xema tenahî, ewlekarî û aştiya cîhanî û herwiha ewlehî û aramiyê di Rojhilata Nêzîk û Navîn de ne, ev erke hene ku heta ji ber vêc û berjewendiyên xwe jî bin piştevaniyê ji hêzên demokrat û pêşketinxwaz yên Îranê bikin, heta ku bi avakirin û cihgîrkirina sîstemeke demokratîk, cîhanê û bi taybet neteweyên deverê ji vê rejîma Sed sala Navîn rizgar bikin.

**Hevalên birêz!**

Ceribînan yê daye xuya kirin ku heke di asta navneteweyî de asteng li hemberî rejîmên dîktator de pêk nehê ew dê bihêz bibin û perçiqandinan di asta hundirîn de dê bi awayekî xurt bimeşînin. Ji aliyê din ve civaka navneteweyî, tenê demekê dikare di siyaseta dujminkarane û neberpirsane ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê serbest bibe ku şahidê cîgirbûna navend û saziyên demokratîk û gelî di Îranê de bin. Ji rêyên bibandor û karîger yên din em dikarin qala piştevaniya bi kiryar ji tevgerên azadîxwaz û demokrasîxwaz yên xelkê deverê, Pirsa demokratîzekirina Rojhilata Navîn, xebat dijî hejarî û parastina jîngehê bikin. Ji bilî vana guhartin di rejîma Komara Îslamî ya Îranê de girêdayî bi vê ye ku Rojava-ger bo demekê jî be-berjewendiyên aborî û bazirganî yên xwe berçav negire. Çunku em hemû dizanin ku têkiliyên bazirganî û aborî tevî rejîmên dîktator, ji van rejîman re rolê stûna piştê heye. Tenê bi vî awayî em dikarin ji aliyekê şahidê cihgîrbûna aştî, azadî û demokrasiyê li deverê de bin û tenê di vê rewşê de ye ku Rojava jî dikare di zirûf û rewşa dilxwaz û biewle de peywendiyeke tev alî di deverê de hebe. Belê, tenê di vê rewşê de ye ku em dikarin hemû bi hev re bas ji berjewendiyên rewa bikin û herweha xizmetê bi armancên bilind yên mirovahiyê ku me hemûyan bawerî pê heye bikin.

**Sipas ji bo guhdariya we bi gotinên min.**

**Dr. Xusro Ebdulayî**

**Atîn 30-31.01.2006'an**

# Demokrasî, biha û piratîka wê

**Beşa 21**



**Kurmanc Hakkî**
**kurmanchakki@yahoo.com**

## Beşdariya siyasî di demokrasiya Parlemanî de

Di gotara berê da hat gotin ku ji bo me Kurdan girîng e bizanibin ku di rewşa civakek pirreng û pirrehendî ya Rojhilata Navîn de pênase kirina şêwaza diyarî kirina berjewendiyên hevbeş bi sadeyiya teoriyên pêwendîdar bi şirove kirina demokrasiyê nînin. Welatên ku Kurdistan di ser wan de hatiye parvekirin li gelek kêmaniyên etnîkî/netewî, olî, zimanî û sosioekonomî pêk hatine ku pirrehendiyeke taybet dide bi şirovekirina cura berjewendiya hevbeş. Xaleke girîng û balkêş ku di pênasekirina demokrasiyê ji aliyê netewên serdest tê berçav girtin, ji bîr kirina rastiya çend rehendî û pirnetewî bûna welatên weke Îranê ye. Eva xaleke lawaz û jar a hêzên demokrasîxwaz yên Îranê ye, yek ji astengên gihîştin bi alîkariya hevbeş di navbera wana da ye.

Di vê beşê de teoriya "Mill" li ser beşdariya siyasî di demokrasiya Parlemanî de dê bihê şirove kirin.

"John Stuart Mill" wek ***Otelarîsên***[1] berî xwe alîgirê demokrasiya Parlemanî yan demokrasiya bi nûnerayetî bû. Ji bo "Mill" beşdariya welatiyan di biryarên siyasî de giraniyek taybet hebû. Ew di vê baweriyê de bû ku beşdariya siyasî ya takekes dibe hegera pêşveçûn û perwerdekirina mirov. Li gor wî dewleta baş ew dewlet e ku parêzgariyê ji berjewendiyên giştî yên civakê dike û ji bo tenahiya baştir ya civakê tekoşînê dimeşîne. Demokrasiya nûnerayetî yan Parlemaniya "Mill" piştgîriyeke berîn ji xwe re kom dike. Demokrasiya Parlemanî heke encameke çêtir ji alternatîvên din bide, bêtir tê piştgîrî kirin. Demokrasiya Parlemaniya "Mill", ne demokrasiyeke cîhanî ye, cî be cî bûn û asta serkevtina wê girêdayî bi asta civakî û siyasî ya welat û civakan ve heye.

Bi dîtina "Mill" demokrasiya li ser bingeha nûneratiyê dikaribe kar bike, ger welatî bixwazibin, amade bin û bikaribin bi awayekî çeleng beşdariyê tê de bikin. Heke ew mercên hatin bas kirin bên cî bi cî kirin, sîstema demokrasiya han bi awayên herî baş dê berhemê bide. Her wek bîrmendê karîzmatîk yê Kurd Dr. Qasimlo jî gotiye: **"Demokrasiya herî xirab ji dîktatoriya herî baş çêtir e."** Bi raya "Mill" jî baştirîn dîktator eger li mirovan zêde jî be nikaribe bi wê başiyê xizmeta welatî bike, ewa ku sîstema demokratîk dikaribe. Li baştirîn sîstema dîktatorî de jî têgihîştina exlaqî û hizrî û jîriya welatiyên pêş nakeve, ji ber ku li ber nebûna alternatîvan û beşdariya welatiyan, mirovan hewce bi geşekirina sîstema hizrî ya xwe namîne. Rewşa han çawaniya (kalîteya) biryardanên dewletî nizim dike. Ji ber ku şiyana welatiyan wek dînama *hêza bi meş* hatiye fetisandin.

Bi vî awayî her wek tê dîtin "Mill" pêşveçûna sincî û hizrî ya welatiyan wek merca baş a dewletê dibîne. Eva ku tu kesek ji bo berpirsiyariya dewletî tê hilbijardin girêdayî bi astê têgihîştina welatiyan û çalakiya wan heye. Asta hişyarî û çalakiya welatiyan kar dike ser çewaniya biryara welatiyan ji bo zêrevaniya ser kar û kiryara biryarderên dewletî û fermî. Li sîstema hikûmetî ya ser bingeha nûnerayetiyê, welatî zêrevanê herî dawî yê kar û kiryarên dewlet û hikûmetê ne. Tenê li sîstema Parlemantarîzmê de ye ku biryarên dewletî li ser bingeha jîrîtî û exlaqî ya dirêjdem tên zêrevanî kirin.

Geşekirina hizrî û asta têgihîştina welatiyan bi vê yekê hatiye girêdan ku sîstema siyasî hetanî çi astekê rê dide xelkê, beşdarî çalakî û dîbatên siyasî bibin. Di nirxandinekê de tevî sîstemên din yên siyasî, qenciya demokrasiya ser bingeha nûnerayetiyê eva ye ku rê dide welatî bi awayekî berfireh beşdariyê di çalakiyên siyasî de bike. Bi vî awayî yek ji armancên sîstema siyasî ya li ser bingeha nûnerayetiyê, zêdekirina beşdariya welatiyan di çalakakiyên siyasî de ye ji bo pêşveçûna asta têgihîştina siyasî û jîritiya wana. Xasmayî beşdariya

www.arsivakurd.org

welatiyan li hilbijartinên deverî û bajarvaniyê wek fêrgehek tê dîtin ku welatî him hînî demokrasiyê dibin û him jî maf û berjewendiyên xwe diparêzin.

Ji ber vê ku merca pêşveçûna asta têgihîştina siyasî û jîrîtî ya welatiyan girêdayî bi beşdariya wan di çalakiyên siyasî de ye, welatiyên gihîştî (balix) diviya mafê hilbijartin û xwe berendam(kandîd) kirinê jî hebin. Bi dîtina "Mill" her welatiyek gihîştî ku şiyana wê hebe, mafê beşdariyê li dengdan û hatin hilbijartinê heye. Bi hizra wî rêgirtin li jina ji dengdanê bi heman ast narasyonal (bê eqlanî) e ku mafê dengdanê li gor rengê mûyê serê mirov bê dabeş kirin. Bi watayeke din bo nimûne xwedî mûyê reş mafê dengdanê hebe, lê xwedî mûyê kej ew mafe tune be. Ew cur dabeş kirine bi dîtina "Mill" tişteke ne rasyonal e. Di şûn de "Mill" bi wê baweriyê bû ku ew kesên ku nikaribin bixwînin, binivsînin û hesab bikin û her wisa ew kesên ku nikaribin bi xwe xwe bijînin, nabe mafê dengdanê hebin. "Mill" herwiha alîgirê rêçareya nisbî (berawirdî) li hilbijartin û dengdanê ye ji bo ku mafê kêmaniyan bê parastin. Ew herwisa alîgirê dengdana wekhev nine, ji bo pêşgirtin li hêz an desthilata yekbêje piraniyê. "Mill" alîgirê dengdanekê ye ku tê de her dengderek li gor asta têgihîştina siyasî û civakî ya xwe deng dide. Asta têgihîştinê di hizra "Mill" de li gor asta xwendin, kar û pîşe û ger hewce be ji rêya cericîn û ezmûnan tê hesab kirin. Sîstema han dibe sebeba wê yekê ku hilbijartin bi destê mirovên xwedî şiyan û jîr were encam dan û asta biryaran jî bilind bimîne. Li gor "Mill" Parlemanter divêt li gor aqil û têgihîştinê li xelkê dî bilintir bin. Ji bilî wê yekê ewana diviya hêza lêkdanewe û biryardanê bi xwe hebin.

Argûmênta cihê raman "Mill" eva ye ku ew alîgirê dengdana bi nepenî nebû û li ser wê baweriyê bû ku divêt dengdan bi awayekî vekirî û eşkere be û ew kesên deng didin, divêt hegera dengdana xwe şirove bikin. Li gor wî dengê eşkere dibe sebeba wê yekê ku dengder asta têgihîştina xwe bibin serê û zanyariyan zêdetir ser argûmêntên hilbijartinê bi dest bînin. Ji bilî wê yekê dengdana eşkere bi raya "Mill" dibe hegera bilindbûna seha berpirsiyariya takekes li hember pirsên giştî û di dengdanê de tenê berjewendiyên takekes nahên berçav girtin. Bi raya wî zexta sehî ya ser dengderan nabe hegea pêşîlêgir di dengdanan de.

Li gor hizra Oteralistî sîstema dengdana "Mill" dibe hegera wê yekê ku baştirîn encam li dengdanê bi dest bê û biryardan bi awayê herî baş xizmeta tenahî û ewlehiya (well fare) civakî bikin. Sîstema siyasî ya "Mill" mafê dengdanê mercdar dike û mafê dengdanê bi wan kesan dide ewên ku şiyana wê hebin. Ew hizre dijî hizra mafê wekheviya dengdana welatiyan ku me di beşên berê de ser wê mijarê axiviye. Ji ber wê ku di sîstema han da takekesan hegerên cur bi cur hene ji bo kar kirine ser biryarên kollektîv de. Digel wê jî hizra "Mill" wek ramanên "Beitz" ku di beşên berê de qala wan hate kirin, giraniyeke taybetî di din bi biryarên siyasî yên ku bi awayekî giştî hatine hizir û gengeşe kirin li hember biryarên ku hizrek ser nehatiye kirin.

Ew bi xwe jî ewa qebûl kiriye ku belkî hizra wî ser sîstema dengdanê bi hêsanî neyê wergirtin. Lê bi hizra wî ew kesên ku biryarên li ser tenahiya civakî didin li kêmaniyê de ne. Li hember wî de "Beitz" li ser wê bawerê bû ku ewa hegerek neraste ji bo rewa dîtina dengdana bi awayê "Mill". Bi raya "Bêitz" heke pesendiya sîstema siyasî li gor biryarên ku dide, bibe bo nimûne girêdayî bi piroseya dengdanê nebe, wê gavê her welatiyek hegerek zor heye deng bi wê sîstemê bide ya ku bi awayê herî zor berjewendiyên wî di dema biryarê de diparêze.

Bi raya "Mill" demokrasiya ser bingeha nûneratiyê hegerên binirx in ji bo çalak kirina welatiyan û perwerdeya siyasî û têgihîştina civakî û asta biryardana wana. Welatiyên zana jî dixwazibin baştirîn berheman li biryarên siyasî wergirin. Bi hizra wî yek ji erkên bingehîn yê demokrasiyê *perwerde kirina* welatiyan e. Hewce bi gotinê ye ku gelek teorîzanên din yên pirsa demokrasiyê bi wê bawerê ne ku demokrasî dibe hegera pêşveçûna asta têgihîştina siyasî û civakî ya welatiyan û wana çalaktir dike. Ser wê mijarê nivîskarê Demokrat yê Amerîkî "Alexis De Tocqueville" (1848-1969) dibêje:

**"Demokrasî renge baştirîn û bikartirîn dewletan pêk neîne, lê ew berhemên ku demokrasî bar tîne tu dewletên bikar û şareza nikaribin berhem bînin. Demokrasî di nava civakê de hêz û şiyanekê belav dike û dibe hegera bizavên bihêz ku tu tişt nikaribe wê hêz û bizavê pêk bîne û tu kes nikaribe muiziceyên demokrasiyê biafirîne. Ewana qazancên rastîn yên demokrasiyê ne."**

[1]Oteralîst hizrek civakî ye, ku bi raya wî divêt kiryarên mirov zortirîn berhem bo civakê hebin. Oteralisma siyasî bi vê wateyê tê gotin ku kiryarên siyasî hetanî çiqas bersiva helbijardeya dengder dide. Li aboriyê de bi wateya qazancê herî zor yê aborî ji bo civakê tê.

**Doma wê di hejmara tê de!**

# Fîlmên Dîktatoran li dawiyê tev wek hev in

**Cankurd**
02.02.2006



Berî niha bi çend salan, li Sûriyê, Mehmûd El-Zûhbî, ku Serokê Civata Gel "Parlamentê" bû, xwe kuşt, an jî hat kuştin. Kesek baş nizane rastî çi bû.

Desthilatdariya Beesiyan da belavkirinê, ku wî camêrî pir pere û xêr û berên welêt ji xwe re civandibûn, û gava hatiye tawanbarkirin, xwe kuşt. Dibe jî ew pir li ber xwe ketibû, poşman bûbû û nema çareyek dî ji xwekuştinê pê ve li ber xwe dîtibû.

Di sala çûyî de jî Wezîrê Hindur, Qazî Kenan, ku berê serkarê livbaziya Sûrî li Libnanê bû, xwe kuşt, an jî dewletê ew kuşt. Dîsa kes ji gelê Sûrî rastiyê nizane. Beesiyan belavkir ku vî camêrî jî ewqas şaşî li Libnanê kiribûn, ku nema paş jêpirsînê li hember dadkarê navneteweyî yê Alman "Detlef Mehlis" di bin barê giran de bijî, lewre xwe kuşt.

Tiştê seyr ewe, ku gelekan gotin: "Wî Serok Wezîrê Libnanê Refîq Herîrî da şehîdkirin." Lê navê wî hîç di rapora "Detlef Mehlis" de nayê lêvkirin. Dewleta Sûrî nevêribû bigota:"Erê wilo bû." Lewra ku Serokê Komarê gotibû:"Eger destê kesekî Sûrî di şehîdkirina Herîrî de hebe, minê pêzanîba!." Lewre Beesiyan devên xwe girtin û li ser têkiliya Qazî Kennan bi şehîdkirina cenabê Refîq Herîrî re tiştekî zelal negotin.

Ji nişka ve, Cîgirê Serokê Komar, Ebdilhelîm Xedam paş 30 salan ji dostanî û hevalbendiyê bi malbata Esed re, ji welêt bazda, reviya çû Fransa û li wir gelek gemar û qirêjiya destjilatdariya Beesiyan derxiste ber ronahiyê...

Niha pirsek heye:"Gelo, bo çi li Sûriyê wilo dibe?."

Bersiv: "Me rewşek wek vê rewşê, berê li Îraqê dît, di dema Sedam Husên de jî hinekan xwe kuşt, gelek ên dî hatin kuştin û ji malbata desthilatdar jî hinek bi derve de reviyan."

Bila malê pir û desthilatdarî seriyên maldar û desthilatdaran bixwen. Fîlmên dîktatoran li dawiyê tev wek hev in.

www.a...kurd.org

# Xizanî û bêkarî di Îranê de

**Hemîd Muxtarî**



Heke em bi awayekî rast lênihêrîneke bi ser rewşa aborî ya niha ya Komara Îslamî ya Îranê bikin, em dê bibînin ku ev rejîme tevî kirîzeke kûr ya aborî berbirû bûye. Ev kirîze ku li mêje di hemû war û biyavên aborî yên rejîma desthilatdar de reh û rîşalên xwe dakutaye, di van çend salên dawiyê de jî herî xurt bûye û her roj serhejmariyeke nû ji hejarî û belengaziyê di Îranê de tê weşendin ku mixabin roj li pey rojê xirabtir bûna vê rewşê didin kifşê.

Li gor rapora nûçevaniya Fars, weşana lêkolînên aborî ya Rojhilata Navîn (MÎS), mijara bêkariyê di Îranê de li hemû warên aborî, civakî, çandî û ramyarî de daye ber şirove û dahûrandinê.

Rapora han dide eyan ku kirîza bêşoliya xurt di Îranê de 40 ji sedê ya nifûsa xelkê vî welatî ku qasê 29 milyon kesan pêk tîne, xistiye bin hêla xizanî û belengaziya mutleq û navincî de.

Ev weşane herwisa dide zanîn ku pêka serhejmariyên vê dawiyê ku Rêxistina Rihetiyê(Rifah) daye nîşandan, 12 ji sedê ya xulyaqetê vî welatî ku dike 9 milyon kes, li bin hêla xizanî û nebûnê de dijîn û %17 yanî 11 milyon kes jî belengaz û feqîr in. Encama lêkolînan nîşan dide ku bêşulî girîngtirîn sedema vî qasê xizaniyê di Îranê de ye.

Niha pirs eva ye ku çima rewşa abori ya Îranê bi vî awayî ye. Îran ku bi şandina 2/5 milyon boşqên neftê di rojê de, duyemîn welatê birêker(bişîner) yê nefta Opêkê tê hesibandin û her boşqeyek petrolê jî pitir ji 60 Dolaran e.

Herwiha Îran xwediyê çavkaniyên binerd yên zaf ên din weke gaz, zêr û ...ye. lêbelê dîsan jî parek zaf ji xelkê Îranê li jêr hêla xizaniyê de dijîn. Ciwanên Îranê rû bi madeyên bêhişker(muxedirat) dikin, leşfirotin di Îranê de xurtir bûye, xwekuştin, telaq yan ji hev veqetiyana jin û mêran, cinayet, bertîlwergirtin, fisada malî, Îdz û ...roj bo rojê zêdetir dibin, ku sebebên bingehîn yên hemû van pirsgirêkane, bêkarî ye. Nebûna firsend û delîveyên baş ji bo texa xwandekar û bijarte yên civaka Îranê bûye sebebê hilatina mejiyan, û tê gotin ku her sal 100 hetanî 225 hezar kes ji zana û şareza û xwendevanên Îranî welatê xwe bi cî dihêlin û koçberî welatên biyanî dibin.

Li gor rapora sala 2005'an ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ku ji aliyê Rojnameya Waşîngton Post ve hate weşandin, Îran rekordar û hejmara yekem ya mutadan (kesê/a ku madeyên sirker bikar tînin) di cîhanê de ye. Bi awayekê ku %2.8 ji nifûsa 70 milyonî ya vî welatî mutad bi madeyêm sirker in, û di vê derheqê, Îran di cîhanê de bê rikber e.

Li gor rapirsiya dewleta Îranê ku Nûçevaniya Fars weşandiye, hatiye zanîn ku %80 ji xelkê Îranê li ser vê baweriyê ne ku têkiliyek rasterast di navbera bêkarî û bikaranîna madeyên bêhişker de heye, çunkî dewlet nikare yek milyon karan ji bo wan ciwanên ku her sal tevlî bazara kar dibin pêk bîne.

Ji aliyê din ve hisar û dorpêçkirina aborî ya yek aliyane ji hêla Amerîkayê ku çendîn salan hatiye birêvebirin, zext û givaşên aborî bi ser rejîma Komara Îslamî ya Îranê herî xurt kiriye û rewşa kirîza aborî ya welat xirab û aloztir kiriye. Ji ber ku ev hisar û dorpêçkirina bûye sebeb ku hejmareke zaf ji kompanî û şirketên Navneteweyî xwe ji pişikdarî kirin di çalakiyên aborî yên Îranê dûr rabigrin. Pirsa çekên Etomî, mafên mirovan, piştevanî kirin ji girûpên terorîstî ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve ji aliyeke din jî arîşe û pirsgirêkên siyasî yên vî welatî ne.

Bi taybetî piştî hilbijartinên 1384(2005)’an û hilbijartina Mehmûd Ehmedînejad, wekî Serok Komar û yekdest bûna zorxwazan û bidestvegirtina desthilatê de vî welatî de, zext û givaşên navneteweyî herî xurt bûne, û me dît ku rejîm bi pêşgirtina vê siyasetê bû sebeb ku dosya Etomî ya Îranê di roja 04.02.2006’an de bo Konseya Ewlekariyê bê şandin. Heke bihê pejirandin Îran dê berengarî hisaran ji aliyê Ewropa û Civaka Navneteweyî bibe, ku ew jî bi ziyan û zerera xelkê û berjewendiyên civakê ye.

Digel kirîzek han ku berbirûyê civaka me bûye, rejîm her salê bi milyar Dolaran diravê vî welatî mizextê girûpên terorîstî, weke Hizbulaha Libnanê, Ensar El Îslam, Hemas, Cehda Îslamî, terora kesayetî û rêberên siyasî yên neyarê rejîmê(opozîsyon), rêberên weke **Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî** ji rêberên Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, herwiha xebat ji bo bidestvexistina çekên Etomî, serkut û çewisandina xelkê, pêkanîna netenahiyê di dever û cîhanê de, maytêkirin di kar û barên welatên cînar û wd... dike.

Helbet divêt were gotin ku qasê bêkariyê li bajarên Kurdistanê de pitir ji deverên din yên Îranê ye. Komara Îslamî her di destpêkê de bi siyaseta tejî ji xizanî û cudahîdanan ya xwe mêzeyî Kurdistanê kiriye û ji her terze pirojeyeyên berhemanîn, avedanîkirin û xizmetkirinê di Kurdistanê de xwe parastiye. Di meşandina vê siyasetê de bi salan e ku Komara Îslamî çêkirina pirojeyên avedanîkirinê û dezgehên berhemanînê di Kurdistanê de bi xurtî kêm kirine.

Paşve hêlana Kurdistanê di warên aborî, avadanîkirin û berhemanînê de pirsa bêkariyê di vê parê ji Îranê de hinde dî xurt6 û zêdetir kiriye û hejarî û belengaziyê zêdetir per û baskên xwe pitir bi ser de kişandiye û herwiha êrîşên leşkerî yên Komara Îslamî li du dehsalên borî di Kurdistanê de, ev civake tevî rewşên dijwar berbirû kiriye.

Niha di Îranê de ne tenê ciwan, belkî bi milyonan kes ji jin, Mamosta, Nojdar, Karker û texên din yên miaşxwor, hejar û destkurt û wd..., hemû neraziyên rewşa dijwar ya îroyî pêk tînin.

Bi her hal ez bawer im rewşa aborî ya Îranê demekê dê geşe bike ku Îran bikare ciheke jêhatî di asta Navneteweyî de misoger bike ku eva jî bi hebûna rejîmeke han bidestve nahê. Çunkî divêt rejîmek di Îranê de desthilatdar be ku ji gel û ji bo gel be. Rejîmek ku di çarçoveya desthilatdariya wê de mirov azad bin, bawerî bi wekheviya jin û mêran hebe, tu sînorekê di navbera kêmaniyên neteweyî û netewa serdest(Fars) de nekêşe. Dewletek ku neteweyên Îranê mezin bizane û xelkê jî mafê vê yekê hebin ku ji hemû tiştên eşkere û nepenî yên wê haydar bin. Rejîmek ku biryara taybetî û biryara giştî bi rêz û hurmet bigre, yanî rejîmeke demokratîk û gel serdest.

www.arsivakurd.org

# Di her deqeyekê de Jinek bi sedema pêgiraniyê dimire



Berpirsiyarê sindoqa xulyaqetê a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di Îranê de got: Di cîhanê û bi taybetî di welatên di halê geşekirinê de li her deqeyê de jinek bi sedema pêgiranîyê dimire.

Mihemed Ebdulehed di hevpeyvîneke tevî nûçegihanê nûçevaniyê Fars de zêde kir ku di astê cîhanê de rewşa nebaş ya paqijiya avisbûnê sedema bingehîn ya mirina jinên 15 heta 45 salî ye. Wî da zanîn ku serbarê şiyana pêşgîrî kirin ji mirina dayikan, 99 ji sedê ya goriyan di welatên di halê pêşdeçûnê de diqewime û sedema wê jî vedigere ser balnedan bi rewşa jiyana dayîkan di astê cîhanê de.

# Li Selmasê gundeke Kurdan hate kavil kirin


Di roja 8'ê Rêbendana sala 1384'an de, hêzên rejîmê çûne gundê Koçk, ser bi devera Şipîrana Selmasê û bi vê hêcetê ku Qayzol û Benzîn ji wir ve bi rêya qaçax bo nava axa Turkiyê tê veguhastin, di kiryareke hovane û bêrehmane de bi Loderê ew gunde ku 10 mal dibin, kavil kirin(bi axê re kirin yek). Piştre bi awayekî gelek nemirovane pez û heywan û şewata zistanê ya malbatên wan sotandin. Bi vî awayî rûniştiyên kurd yên wî gundî di sir û seqema zivistanê de malwêran û koçberî deverê kirin.

Di vê derheqê de hevce ye em bibêjin ku herçend şandina gayzol û benzînê bi awayê qaçax bo derveyî herêmê kiryareke ne yasayî ye û xelk jî ji ber neçarî û seba bêşoliyê û bo dabînkirina aliyê kêm ya dahata jiyana rojane ya xwe vî karê bi tirs dikin, lê çima dibe bedela çareserkirina pirsa bêkariyê û kêm dahatî û destkurtî ya xelkê(nemaze xelkê gundên derdorên sînoran), rejîmê rêçareyên hovane û dûr ji qanûnên mirovahiyê wek bûyera ku me qala wê kir û kuştin û birîndar kirina xelkê deskurt û bêpar kirin û herwiha lêdana xisar û ziyana malî bi vî xelkî bona vê çendê ku destkurtir bin, digire pêş û dimeşîne.

Xincî vê ku ew xelke Kurd in û rejîm li çareserkirina arîşeyên wan di hemû waran de xemsare, lewra dixwaze ji rêya tund û tûjiyê û tepeseriyê wan bêdeng bike û tu bersîveke din bo vê pirsyarê nine.

**Rêxistina Efûya Navneteweyî:**

## "Divêt cezayê îdama her du keçên di girtîngehên Îranê de bihê betal kirin"



Rêxistina Efûya Navneteweyî daxwaza betal kirina cezayê îdamê ji bo du keçên, di girtîgehên Îranê de kir.

Di vê derheqê de, rêxistinê daxwaz ji rayedarên Komara Îslamî kir ku cezayê îdama her du keçên 18 û 19 salî bi navên Nazenîn û Dilaram Darabî betal biket.

Hêjayî gotinê ye ku Rêxistina Efûya Navneteweyî daxwaz ji Îranê kir ku dest ji îdam kirina zarok û nûciwanan hilgire û li gorî Peymannameya Navneteweyî kar biket.

# Li Kurdistanê Jin zêdetir ji mêran xwazyarê telakê ne

Lêkolînên serhijmêrî yên zewac û berdanê(telak) di parêzgeha Kurdistanê de didin xuya kirin ku di vê parêzgehê de bi terazeke navincî rojê 88 zewac û li hember de 11 telak û bi wateyek din rojane 5/5 nimûnên telakê tên encamdan.

Eva di halekê de ye ku parêzgeha Kurdistanê di warê zêde bûna ji hev veqetiyana jin û mêran, yek ji 3 parêzgehên yekem yê Îranê ye.

Li gorî rapora nûçegihanê Îsna, lêkolînên serhejmariyê di vê parêzgehê de didin xuya kirin ku 60 ji sedê ya xwazyarên telakê li dema seredan kirin bi dadgehan, jin 30 ji sedê mêr û 10 ji sedê jî li ser rezamendiya her du aliyan e.

# Xizanî û destkurtî bû sedema xwekuştina ciwanekê li Mehabadê

Roja 23'ê Rêbendana 1384(12.02.2006)'an ciwanekî 18 salî bi navê Îsa Dihnat ku yek ji xwendekarên herî baş di rişteya "Riyazî-Fîzîk" di xwendingeha Emîr Kebîr'ê de bû, seba destkurtî û hejariya malbatî û zext û givaşên malî ji bo domandina xwendinê xwe şewitand û canê xwe ji dest da.

Hêjayî gotinê ye ku eva ne kesê yekem û dawiyê ye ku ji ber belengazî û hejariyê hewara xwe bo xwekuştinê dibe, belkî bi sedan kes ji ciwan û xortên welatê me bi sedema wan pirsgirêk û astengan bi vî awayê nexweş dawî bi jiyana xwe tînin.

Bêguman bingeh û binyata van tev mijarane jî vedigere ser nebûna delîveyên karî û gelek asteng û kêmasiyên din... ku berhem û diyariya 27 sal desthilatdariya Rejîma Komara Îslamî ya Îranê ji bo gelên bindest yên Îranê ye.

# Rejîm bi hêcetên cur be cur ve mijûlê girtin û hepsî kirina ciwana ye

Kirêgirtiyên rejîmê heyamek e li bajarê Mehabadê de bi terzên cur be cur dest bi girtin û radestkirina ciwanên Mehabadê ji bo girtîgehan in.

Kirêgirtiyên rejîmê di vê derheqê de heyamekê berî niha bê tu sedem, belge û sûçek, li taxê Çarçira çend ciwan ku navê du ji wan Luqman Akendî û Qasim Elîzade ye dest bi ser kirine.

Herweha li taxê Erdên Bajarvaniyê ji êrîş birine ser 'Kulûpa Şeqayiq' û di wir de jî çend ciwan destbiser û radestî girtîgehê kirine.

Herweha pêka nûçeyeke din çend rojan berî niha di nêzîk Taksî Telefonî a Pîrozî di taxê Sêaşan de, hêzên rejîmê tevî ciwanek bi navê Yûnis Nebevî de tûşî pevçûnê dibin. Paşan navhatî hiltê û heta gihîştina vê nûçeyê tu zanyariyek li ser nine.

Her di doma azardana xelkê de Hêzên rejîmê hejmarek ji wan kesên ku seredana tixûbên Îran û Îraqê dikin, bê tu sedemeke diyarî kirî ku navê 2 kes ji wan Ehmed Mam Qadirî û Tahir Remezanî ye girtine.

**Hunermenda stranbêj ya Kurd, Şehrîbana Kurdî:**

# "EZ DIKARIM BI RÊYA STRANBÊJÎ Û MUZÎKÊ XWEŞÎ Û NEXWEŞIYÊN GELÊ XWE BÎNIM ZIMAN Û DI TEKOŞÎNA AZADIYA GELÊ KURDISTANÊ DE BIBIME AWAZ Û DENGÊ GELÊ XWE"

*Hunermenda stranbêj ya Kurd, Şehrîbana Kurdî naveke nasyar û bi nav û deng e. Xebat û xizmetên wê hunermenda dengxweş û dengzelal ji bo muzîk, huner û çanda Kurdî ji her kesê re kifş û eşkere ye. Mirov nikare di van çend hevokane de deng, xizmet û keda Şehrîbanê rave bike ku hêjayî xebat û kesayetiya wê ya hunerî be. Ji bo vê çendê divêt lêkolîn û dahûrandineke kûr û berfireh bihê kirin. Midehê çend salan bû ku me di qada muzîk û hunera Kurdî de dengê Şehrîbanê yê xweş û zelal guhdarî nedikir! Her wiha tu berhemên wê jî ne diderketin. Lê vê dawiyê bi dana kaseteka nû ya stranan bi navê **EVÎNA STRANAN,** her kes matmayî kir.*

*Li dor pêtir zanîn li ser dîtin û ramanên Şehrîbana dengxweş li ser muzîk, stran û hunerê, bêdengî û nebûna xebatên wê di dema 10 salên borî de, rewşa muzîk û hunera Kurdî, pirsgirêk û astengên ser rêya jinên hunermend yên Kurd û gelek mijarên din... me bi hewce zanî bi Şehrîbana Kurdî re hevpeyvîneke pêk bînin û wê bînin ziman û axavtinê...*

**Hevpeyvîn: Azad Kurdî**



**Di destpêkê de bo me bas bike, Şehrîbana Kurdî di malbat û civakeke çawa de mezin bûye ku hunermendeke wiha dengxweş û navdar lê çêbûye?**

Ez li Izmîrê di nava malbateke nîv halxweş(mutewsit elhal) de hatime dinê. Ji nav 6 keç û 3 lawan de zaroka malbatê ya mezin ez im. Bavê min karmendekî dewletê bû û ji bona wê jî malbata me berî 40 salî koçberî metropolek ji yên Turkî bajarê Izmîr'ê bûye. Ez bi esila xwe ji gundê Xorsê yê girêdayî bajarê Qiziltepe(Girê Sor) li wilayeta Mêrdînê me. Herêma jiyana malbata me ji aliyê xwe yê dîrokî pir kevnar û xwediyê çand û hunereke dewlemend e.

**stranbêjî û muzîk ji te re tê çi wateyekê?**

Bo min stranbêjî û muzîk tê gelek wateyan. Ez dikarim bi rêya muzîkê xweşî û nexweşiyên gelê xwe bînim ziman. Ya herî giring jî, bi rêya stranbêjî û muzîkê, ez dikarim di tekoşîna azadiya gelê Kurdistanê da bibime awaz û dengê gelê xwe. Ji bo ku ez jî bi rêya stranbêjiyê ji bo gelê xwe têdikoşim, pir serbilind im.

Bi rastî îro di civaka gelê Kurd da stranbêjî di asteke gelekî xerab da ye. Ji ber ku fedakarî her ji hunermend tê xwastin. Lê hunermend birçî ye, nexweş e, kesê hay jê tune ye. Heta îro kesî li deriyê me nexistiye û ne gotiye "hevala Şehrîban an xûşka Şehrîban ka çi pêdivî yên we hene? Ma lazimiyeke we heye an tune ye? An jî çi alîkarî ji we re lazim e? û hwd…" Her ji me hatiye xwastin û me xizmet kirî ye. Em bi xizmeta ji bo gelê xwe kêfxweş in, lê divê ku em jî neyên ji bîr kirin. Hunermend heta ku sax e kes lê xwedî dernakeve. Piştî ku dimirin, her kes dibêje **"ax û wax. Filan hunermend gelekî baş bû û nizanim çawa bû, çilo bû......"** ev gazinê me di serî da ji rêxistin û partiyên Kurdan û her wisa ji gelê me ye jî.

**Te kengê dest bi karê stranbêjiyê kir û çawa bû te biryar girt vî karî bikî?**

Sala 1983'an hêşta ez 13 salî bûm ku di kêbirkiyeke muzîkê ya salane de di nava hemû xwendevanên bajarê Izmîrê de yekemîn derketim. Kêbirkê ji aliyê (Turk Halk Mûziki) hatibû organîzekirin û ji aliyê xweşiya deng û hostatiyê de ez di nava 32 kesên ku di kêbirkiyê de beşdar bibûn, min pileya yekemîn bi dest xist û hatim xelat kirin. Strana ku di wê rojê de min xwînd bi zimanê Turkî bû û navê stranê jî **"Ben Dogarken Aglamişim (Dema ku ez hatime dinê, ez giriyame)"** bû.

Min di destpêkê de bi teşwîqa Xaleta xwe ya bi navê Soreya yê ku pir jî dengxweş e, dest bi karê stranbêjiyê kir û niha jî bi awayekî bilinditir li ser hunera xwe disekinim. Lê bi awayekî profesyonal ji sala 1991'an dest bi tomarkirina stranên xwe kir û di wê salê de yekemîn kasêta xwe ya bi navê **"Ez keç im, keça Kurdan im"** di nava gel û muzîkhezên Kurd de belav kir. Beriya wê bi salekê min li cem hunermendên bispor li ser perwerdekirina dengê xwe kar kiribû û dizanî ku çawa qirka(gewriya) xwe ji bo stirîna lorîkên Kurdî bikar bînim.

**Tu rewşa muzîk û hunera Kurdî ya îro çawa dinirxînî?**

Rewşa muzîk û hunera Kurdî ya îro di nava başî û nebaşiyê da ye. Her hunermend û her muzisyen dibêje: "Ez muzîka Kurdî çê dikim." "Kaseta herî baş ya min e." "Muzîka min muzîka modern a Kurdî ye". "Ez bi muzisyen û serkarên herî baş re xebitîm" û filan û bivan....... Yanî ez rewşa muzîka Kurdî ne baş dibînim. Ji ber ku hejmara yên ku zerarê didine Muzîka Kurdî ji yên ku dixwazin baş çê bikin, zêdetir e. Ji hêla din ve kes nema zêde li ser kalîta (qualitet) Muzîka Kurdî rabiweste. Ji ber ku muzîk jî ketiye qada ticaretê. Yanî ji bo hunermend û Fîrmên Muzîkê pere qezenc kirin, yê bûye armanca sereke. Kengî ku armanc ticarî be, wê demê stranek dikeve rewşeke gelekî xeter de. Yanî li gor min rewşa muzîka Kurdî ber bi xerabiyê ve diçe. Divê ku rêxistin û rêvebirên Kurdan û bi nemaze jî Wezîrê Çand û Hunerê yê Parlementoya Herêma Kurdistanê bi taybetî li ser vî karî rawestin. Ji bo pêşketin û xwedî derketina li dengbêj û hunermendên Kurdistanê arşîveke baş çê bikin. Yanî di derheqa vê mijarê da gelek tişt dikarin werin gotin. Hêviya me ji hunermend û Fîrmên Muzîkê ewa ye ku; huner û Muzîka Kurdî xerab nekin, ji bo berjewendiyên şexsî vê muzîka bav û kalên me, ev muzîka ku îro bûye sedemê azadiya me û ev muzîka ku bi hezaran Kurdan canê xwe ji bo wê dane xerab nekin!! talan nekin!!!

**Te di destpêka karê muzîkê de zêde guhê xwe dida kîjan dengbêja? Niha çawa?**

Min di destpêkê da zêdetir li Mihemed Şêxo, Şivan Perwer, M. Arif Cizrawî, Eyşe Şan, Seîd Yûsuf, Tehsîn Taha, Erdewan Zaxoyî û hwd guhdarî dikirin. Bi taybetî min ji Şivan Perwer, Mihemed Şexo û Tehsîn Taha re guhdarî dikir.

**Wekî bingeh kîjan dengbêjê/î bandor kiriye ser karê te yê hunerî yan bêjim ji te re bûye bingeh?**

Wekî bingeh zêdetir bandora nemir Mihemmed Şêxo û Şivan Perwer ji bo min bûn bingehek û bandora wan li ser muzîka min û dengê min çê bû......

**Dibêjin ku Şehrîban mireveke oldar e. Lê xizmetên te bi huner û muzîka Kurdî ew qas zaf in ku ravekirina wan zehmet e. Çawa ye ku oldarî ji bo te di xebata hunerî de nebûye asteng?**

Berî her tiştî ji bo van îltîfatên we zor spas. Ev pirs ji bo min girîng e. Ji ber ku dînê Îslamê di warê mafê jinan û her wekî din di gelek waran de ji hêla nehezên Îslamê ve kêm û şaş hatiye danasîn. Xwedê Teala dengekî xweş daye min. Ji bo vê dayîna yezdanê dilovan ( Xwedê Teala) ez ji yezdanê dilovan (Xwedê Teala) re spasdarim. Cîhad tenê ne li ser mêran ferz e, her wiha li ser jinan jî ferz

www.arsivakurd.org

e. Ez oldariyê ji bo xwe ne asteng, belkî bilakîs û hêzeke herî mezin dibînim. Min dikarî bi vî dengê xwe gelekî pere kezenc bikim. Min dikarî dev, çav û guhên xwe ji vê zilm û zora li ser gelê Kurd ra bigrim (qapat kim) û tenê ji bo berjewendiyen xwe bixebitim. Lê, ez ji Xwedayê xwe tirsiyam. Ji ber ku welatê me bindest e, bi hezaran gundên me hatine şewitandan, bi milyonan însanên me koçberî her çar hêlê cîhanê bûne, bi hezaran însanên me di zîndanan de ne, û bi hezaran însanên me jî li ber çavan hatine kuştin û hwd. Dînê Îslamê dibêje: "Li hemberî vê zilm û zorê cîhad (berxwedan) li ser we ferz e. Ew kes çi jin dibe, çi jî mêr divê ku li hemberî vê zilm û zorê serê xwe rake û li ber xwe bide." Her wiha ne tenê gelê Kurd her kesê ku dibêje ez Misliman im, divê ku li hemberî vê zilma li ser gelê Kurd, tevî gelê Kurd, li hemberî wan zalim û dagîrkeran têbikoşin. Ta ku Kurd ji bin vê zilm û zorê derkevin û weke her neteweyekê azad bijîn. Wekî din ez hunera xwe ne ji bo ku bibime miroveke gelekî navdar çê dikim. Ez hunera xwe li gor exlaqê civakê bikar tînim. Ez dixwazim hem bi hunera xwe û hem jî bi kesayetiya xwe (şexsiyeta xwe) ji însanên xwe re bibime mînak. Ji ber vê yekê heya îro min ji şexsiyeta xwe tu car tawîz nedaye. Ev dinya fanî ye û ji tu kesî re nemaye. Xirabî, zilm, kîbîr û xwe mezinkirin; karê cahil, nezan û kesên derveyî mirovahiyê ne. Ji ber wê pêwîst e ku em xizmetê ji bo însanan bikin, em alîkariyê bi kesên xizan û bindest re bikin. Ger ku em nikaribin qenciyê bikin, pêwîst e ku em xirabiyê jî nekin. Ez bi taybetî dixwazim vê bêjim: "Ger ku me li gor emrê Xwedê Teala hereket bikira, hetanî niha welatê me sed carî azad dibû."

**Nêrîna te li ser jinên jêr bi kurtî çî ye?**

1. **Meryem Xan**
2. **Eyşe Şan**
3. **Gulistan Perwer**
4. **Merziye Rezazî(Ferîqî)**
5. **Fatê**

Xûşkên min yên hunermend bi taybetî Meryem Xan, Eyşe Şan û Merziye Rezazî (Ferîqî) rahma Xwedê li wan be.. Xwedê cihê wan bixe biheşt. Gulîstan û Fatê jî du xûşkên min yên gelekî hêja ne. Meryem Xan, Eyşe Şan, Merziye Rezazî (Ferîqî), Gulîstan û Fatê di nava civaka gelê Kurd de xwe bi hunera xwe dane qebûlkirin. Her yek ji wan li gora xwe guhdarên wan hene. Hurmeta min ji wan re heye. Ez nikarim di derheqa wan de tu şîroveyî bikim. Ez bawer dikim ku şîroveya herî baş di derheqa hunermendan de şîrove û nêrînên gelê Kurd e.

**Di qada huner, stiran û muzîka Kurdî de jin gelek kêm beşdar in. Tu sedemên vê pirsgirêkê çawa dinirxînî?**

Sedêmên kêm beşdarbûna jinan berê, urf û adetên herêmî, paşvemayîna Rojhilata Navîn û hwd... bûn. Yanî her demekê li gora xwe zahmetiyên xwe hene. Sedemên îro yên yekemîn, derfetên aborî ne. Yanî jinek ji bo ku bikaribe di nava stiran û muzîka Kurdî de cihê xwe bigre, berî her tiştî divê ku derfetên wê yên aborî hebin, an jî hinek kesên dewlemend bi wan re alîkariyên bikin, an jî sazî û rêxistinên Kurdan li wan xwedî derkevin. Mesela gelek jinên dengxweş hene, lê ji ber ku tu kes alîkariyê bi wan re nakin, nikarin tevlî stran û muzîka Kurdî bibin. Yanî îmkanên aborî sedemên sereke ne. Ev zehmetî ji bo mêran jî hene. Gelek sedemên din jî hene, lê ez bawer dikim em bi pirseke di nava hevpeyvînekê da nikarin bersîva wan sedemên din bidin.

**Ziman dikare di karê stiranbêjiyê de çi rolekê bilîze?**

Weke ku tê gotin "ziman hebûna gelan e." Pêwîst e ku stranbêj û helbestvan di nivîs û stranbêjiyê da li ziman û giramera ziman gelekî diqatê bikin. Hewce ye ku ziman bi zanebûn were bikaranîn. Ger ku helbestvan û stranbêj ziman baş bikar neînin, ji bo nifşên nû dê bibin mînakên ne baş.

**Kaseteke te vê dawiyê derket, bi rastî kareke mezin, hêja û bilind di muzîka Kurdî dê were hesibandin. Tu karê vê kaset yan sêlik(CD)a xwe çawa pênase dikî?**



Kaseta CD ya min ya bi navê **EVÎNA STRANAN** di bin gelek zehmetî û mercên giran de hate çê kirin. Ji ber ku ev nêzîkî heft sala bû ku min kaset çê nekiribûn. Guhdarvanên min jî her ji min dipirsîn û digotin: "Tu çima kaset çê nakî?" "Kaseta te ya nû dê kengî derkeve?" û hwd… . Bi rastî min jî dixwast ku ez her sal kasetekî derxînim, lê îmkanên min yên aborî tunebûn. Welhasil min û zilamê min (bavê zarokên min) me biryar da ku em xebateke gelekî baş çê bikin ku em, hem tola heft salên derbasbûyî jê hilînin û hem jî bo muzîka Kurdî di qada muzîka cîhanê de bibe numûneya xebateke gelekî baş bikin. Gava me ya pêşî ew bû ku serkarê vê kasetê kesekî ku muzîka Kurdî baş zanibe û baş nas bike bû. Ew kes jî mirovekî gelekî bi hurmet, dirust û xwedî exlaqekî baş, Mamoste Dilşad Seîd bû. Bi rastî Mamoste Dilşad ji bo vê kasetê xebateke gelekî giranbuha kir. Xwe gelekî westand. Yanî ji bo ku kaseteke baş çê bibe çi ji destê wî hat texsîr nekir. Zilamê min jî ji bo ku kaset gelekî baş çê bibe, xwe da ber hemû mesrefan û xwe gelekî êşand. Her wiha du (2) helbestên zilamê min jî di vê kasetê da hene. Her wiha birayê min yê hêja Kakşar Oremarî jî ji bo ku kaset bibe numûne gelekî alîkariya min kir. Kakşar di hemû xebatên min da her dem ji min re bûye destek. Ez silav û rêzên xwe bi taybetî ji bo Zilamê xwe Şêrgo Ehmed (Fatih Ileri), Mamoste Dilşad Seîd, Kakşar Oremarî û hemû kesên ku keda wan di wê xebatê da derbas bûye, pêşkêş dikim. Kaset li gora E - Mail û mesajên ku ji min re tên bi hezkirineke gelekî mezin tê pêşwazî kirin. Heta Muzisyen û muzîknasên Ewropî bi nirxên gelekî giranbuha nêzîkî vê xebatê dibin û pîroz dikin. Her wiha muzisyenên Kurd, rewşenbîrên Kurd jî bi başî nêzîkî vê kaseta min dibin. û weke nimûne didine xuya kirin. Ez dikarim di derheqa ve kaset û CD ya xwe da gelek tiştan bibêjim, lê ez wê nirxandinê ji guhdarên xwe yên hêja re dihêlim.......

**Di nava gelê Kurd de kêm kes heye ku dengê te yê xweş û zelal guhdarî nekiribe. Te ji bo pêşerojê çi plan û projeyek heye?**

Ji bo pêşerojê planên min ev in: Bi rêya organîzasyonên baş ez dixwazim li her çar aliyên Kurdistanê konsertan bidim. Bi rêya sponsoran ez dixwazim ji bo kaseta xwe çend Kilîban bikêşim. Kesên ku bixwazin ji bo kilîban bibin sponsor, dikarin vê xwesteka xwe bi rêya navnîşanê: **info@sehribana-kurdi.com** xwe bigihîjine me. Her wiha heke ku îmkan û derfet hebin, ligel Mamoste Dilşad Seîd em dixwazin hinek konsertan li darxînin. Her wiha ji bo kaseteke nû jî ez xwe amade dikim û hazriyên min hene. Ger ku fîrmayên baş hebin, ez dixwazim vê kaseta xwe ya nû li gel wan çê bikim. Projeyên min ev in.

**Ji evîndarên deng û berhemên xwe re tu dixwazî çi bibêjî?**


Berî her tiştî ez ji bo evîndarên deng û berhemên xwe re spasî û silavên xwe yên germ pêşkêş dikim. Hezkirina wan me li ser piya digre. Rexne û pêşniyarên guhdarvanên min dê ji bo min bibe hêzeke mezin. Ez hêvîdarim ku hemû guhdarvanên min Malpera min ya bi navê: **www.sehribana-kurdi.com** ziyaret bikin û nerînên xwe ji min re binivîsin.

Ez hemû evîndarên deng û berhemên xwe bi silavên germ û şoreşgerî silav dikim, di jiyana wan de serkevtin, kêfxweşî û tenduristiyeke baş dixwazim. Ez hêvîdarim ku ez bi berhemên hîn xweştir derkevim pêşberî guhdarvanên xwe. Emanetî Xwedê bin..

www.arsivakurd.org

# NE KUŞTIN Û NE JÎ XWEKUŞTIN!

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Her hebûnek ji tunebûnekê der dibe Û her jiyanek jî bi mirinekê re diwelide. Bi rastî ku hebûn tunebûya, tunebûn jî tunebû; û ger ku jiyan tunebûya mirin jî tunebû.
Her heyîn ligel ku bi dijber û dijwateya xwe re dijî, her wiha her gav pê re di nav nakokî û pevçûneke bêeman de ye jî. Ev pevçûna bêeman dike ku yek, serê ya din bixwe, wê têk bibe an jî dabelihîne. Bi kurtayî her kirû, hem dibe mak û kana xwe û dijberê/a xwe û hem jî dibe jêder û kujerê/a xwe û dijberê/a xwe

Jiyan û mirin; du kirûyên dijber û dijwate; du têgihên têkel û têkildar; du rastîniyên têger û jênager û du dijminên şerûd û şerîr(neqenc) ên ku qet ji hevdû naqetin...Her du, ne li hevdû dikin û ne jî bêyî hevdû dibin. Ne ji hevdû diqetin û ne jî ji hevdû re dibin yar. Yek li pişt pehniya ya din e. Yek tirba ya din dikole. Yek ji hebûna ya din zivêr û bêzar e. Yek li pey tunekirina ya din e. Her du bûne qîr û belaya serê hevdû, û her du jî ne bi kuştin tên û ne bi hiştin...Her du jî durû ne. Car heye mirin, wekî mêvaneke bêwext (di dirbê jiyanê de)li mala mirov diqeside, û car jî heye jiyan, wekî mazûbaneke rûsar û dilhişk(di dirbê mirinê de) mirov ji ber deriyê xwe diqewirîne. Car heye mirin, ji nişka ve bi navê jiyaneke nemir, derdikeve pêşberî mirov; mirov dixapîne û li pey xwe dikişîne, û car jî heye jiyan mirov hêdî hêdî arasteyî mirineke bêveger dike û li tunebûnê dihesilîne.

Bi vegotineke aşkeratir, tu tişt li dewsa xwe nemaye. Êdî wisa bûye ku mirov nema dikare mirin û jiyanê jî ji hevdû veqetîne. Ne mirin wekî berê bi tengêla ruhstîn dikeve û li deriyê jiyanê dide, û ne jî jiyan wekî mazûbaneke mêvanhez, bi serbilindî mirinê diezimîne mala xwe. Ne mirin wekî berê mîna mêvanekî mêrxas li ber deriyê jiyanê peya dibe, û ne jî jiyan wekî pişîkeke heftruh rojê ruhekî li ber lingê mirinê radixe. Ne mirin wekî berê ji naza (ji birçîna) diranên xwe yên qîq şanî jiyanê dide, û ne jî jiyan wekî dostekî qedîm, bi comerdî destê xwe dirêjî mirinê dike.

Mirin jî, wekî serdest û serwerên dinê yên durû û dirende, îro reng û dirûvê xwe guhertiye. Çawa ku serdest û şerxwaz, bi navê qencî û mirovheziyê rojê welatekî dagîr dikin û gelên cîhanê bi hêviya çûna bihuştê diewirînin; mirin jî bi mebesta ku mirovên bindest ji ezaba jiyanê reha bike, wan bi kuştin û xwekuştinê qanih dike û dixapîne. Birastî cihê ku jiyan ji ezabê qebrê notir û dijwartir be, dê mirov çima xwe nespêrên mirina dilovan û dilbirehm û umrê xwe yê heyî di ber mirinê de xerc neke? Îcar li cihê ku mirin wekî deriyê xêrê û riya xelasiyê bê dîtin, dê çima mirov temenê xwe yê mayî di riya jiyanek qeterehm de biserifîne?

Bêguman ji bo kuştin û xwekuştinê hin sedem û eger tên afirandin. Ev yek jî miqîm ji hêla neyarên mirovahiyê û dijminên jiyanê ve pêk tên. Belê dîsa jî sedem, hincet, armanc û niyet çi dibe bila bibe, divê tu car kuştin û xwekuştin wekî çareseriyê neyên dîtin, û jiyan bi mirinê neyê guhertin. Lewre jiyan bi qasî ku mirov di oxira wê de bijî girîng û manîdar e. Gotina pêşiyan e; **'Tu kes ji agirê xweş nareve.'** Ne ji neçarî be tu kes zû bi zû nabe ruhstînê jiyana xwe û belaheq xwe nakuje.

Xwekuştin û cinayet birayê hevdû ne. Belê em dinihêrin kuştin û xwekuştin jî li heman cih û warî bicih dibin. Lewre baş tê zanîn ku civakên paşmayî, bindest û bintûte her gav ji civakên pêşketî, azad û şermende bêtir nasdarî kuştin û xwekuştinê bûne/dibin. Dibe ku mirin û jiyîna mirov her gav ne di destê mirov de bin. Belê girîngî pêdan û watedayîna mirin û jiyanê her gav di destê mirov de ye. Wekî ku Lucretius jî dibêje: "Mirin, ne bi saxî dikare xerabiyê bi we bike û ne jî bi mirîtî: Bi saxî nikare bike, lewre hûn dijîn; bi mirîtî nikare bike, lewre hûn najîn."

Heta ku jiyan ji mirinê erjengtir û tirsnaktir nebe, divê tu kes zû bi zû serî li mirinê nede, û heta ku mirin ji jiyanê birûmetir û xiretir nebe, divê tu kes jiyanê bi mirinê nede. Ji bo wê mirov bi hêsanî dikare bibêje; mirineke biwext ji jiyaneke bêbext, bixêrtir û rûmetir e. Belê ne kuştin û xwekuştin!

Kaniya Helbestan

## JIYAN

Latîf Epozdemir

Hetewa min
/ku winda bû li kolanan/
çav dibin hivrona şevan
Rojên min
/mij û moran in
/mîna dilê min
/mal wêran in.
Xezala kûvî jî
/ku li çiyê /
sitar nake
/bêy rojê.
Mîna min e /
şensê wê /
ew jî
/navê
/bê pariyê
/ji jînê.

## JÎ BO YARÊ KÎLAMEK

Yara min a çav belek
Ji avê tê xweş gelek
Bextê wê tim xerabe
Xweşî ne dayê felek.

Dibê dûrî min here
Piştî çend salan were
Dema dinya bû sayî
Birevîne min ji xwe re.

Çima tu dûr disekinî
Ma qey ez xaçperest im
Tu nêçîra kuvî yî,
Yê min jî tîr bi dest im.

Beybûn vebûn tu nehatî
Sorgul xwîn bûn ji kederê
hesret di çavan de mam
Were holê ji pişderê.

Zû dereng ez û tu yar in
Li pişta me xem û bar
Dil heliya ji cudayê
Paşeroj hê ne diyar in.

Bi awazê bibe guhdar
Ji asîman tu were xwar
Dil kovan e, birîn xedar
nikare nû bibe dildar.

Ji kilamê bigre hiner
Heta sar be agir ji dil,
Tu silavê bike guher
bibe dildara perwer.

Kî dibêje ez pola me
Bi agir bêşewat im
Navêje dil bi yekcarî
Ku jê agir zû sar bibe.

Tîrê eşqê dax dike dil
Mefer nade bikî sebat
Ji agir e qefesa sîng
/hesin tê da dibe polat.

www.arsivakurdi.org

# Çend gotinek derheq Muzîka Caz

**Amadekar: Dara**

Wek tê zanîn, di cîhanê de çendîn curê muzîkê hene, ango muzîk bi çendîn awayan tê lêxistin, ev çende jî vedigere bo wan çerx û serdemên ku muzîk tê de hatiye bihorandin û girîngîdana wan pisporên şareza yên warê muzîkê ku di wan serdemane de dijiyan.

Peydabûna wan terzên muzîkê ji me re dide xuya kirin ku îro muzîk heya çi qasekê pêşkevtiye û îro muzîkê di cîhanê de çi xizmeteke mezin pêşkêşî hemû miletan diket, lewra îro gelek neteweyên cîhanê bi muzîkê têne nas kirin û weke nasnameya wan ya neteweyî tê hesibandin.



Muzîka Caz yek ji wan cureyê muzîkê ye ku lêxistina vê xwediyê taybetmendiyeke bilind e, ev taybetmendiye jî dîsan vedigere bo ser wan cure alavên ku di vir de tên bi kar anîn. Zaf şareza û lêkolînvanên di warê muzîkê de dibêjin ku ev rengê muzîkê bo cara yekemîn di Afrîqayê de peyda bûye. Hin yên din jî dibêjin ku ev rengê muzîkê bi navê muzîkvanekî Amerîkî di koma **Sebazm** de hatiye bi nav kirin. Peydabûna Muzîka Caz dizivire bo derdora sala 1900'an, ango destpêka sedsala borî. Piraniya wan muzîkvanên Amerîkî ku Muzîka Caz bi kar tînin bi xwe mifahê ji muzîka Afrîqî werdigirin, mîna muzîka (Rak Taym). Eva cureyek ji muzîka folklorî ya Afrîqayî ye. Ji ber ku gelek muzîkvanên Afrîqî ji welatê xwe mişextî bibûn û li cihên weke Amerîkayê akincî bibûn, karî bûn bibin xwedî bandor li ser muzîka vî weletî.

Di Muzîka Caz de zaf alavên muzîkê tên bikar anîn ku her yek ji wan xwediyê taybetmendiyekê ne. Piraniya alavên sereke di Muzîka Caz de alavên bayî(hewayî) ne ku têne bi kar anîn, mîna alavên "Tirambêyê", wate em dikarin bêjin ku alavên Tirambiyê alaveke destpêkî ye di muzîka Caz de. Herwiha hin ji wan alavên sereke ku di Muzîka Caz de têne lêxistin, evên jêr in: Def, Banco, Gîtar, Sanfonî, Kontir Bas, Dirams). Niha di seranserê cîhanê de ev muzîke bi awayekî berfireh girîngî pê tê dayîn û roleke ektîv û bibandor di asta cîhanî de dilîze. Hêjayî gotinê ye ku ev muzîke weke rîtmên Marşan di zaf rê û resmên leşkerî de tê bikar anîn.

**Jêder: Kovara Huner, hejmar 12**

## Rewşa nebaş û nebûna pirtûkên Kurdî
### di pitûkxaneyên Mehabadê de!?

Di bajarê Mehabadê de tenê 2 pirtûkxaneyên giştî bi navên pirtûkxaneya "Şêx Şeldût" û Rêxistina Çandê ya Îslamî hene.

Hêjayî gotinê ye ku serbarê vê yekê ku zêdetir ji 5 hezar kesî endamên van du pirtûkxaneyan in, lê hejmara pirtûkan di wan de zor kêm in û piraniya wan pirtûkan jî kevn in û bersîvderê daxwaziyên xwendevanan ninin. Yek ji kêmasiyên din jî biçûk bûna holên xwendina pirtûkxaneyan e.

Hêjayê gotinê ye ku hejmara pirtûkên bi zimanê Kurdî di van du pirtûkxaneyan de zor kêm in û hejmara wan li serhev nagihîje 500 pirtûkan û piraniya wan jî pir kevn in û nayêne xwandin. Endamên pirtûkxaneyan hewlekî zor dane ji bo zêdekirina hejmara pirtûkên Kurdî û yên ku bersîvderê daxwaziyên van bin. Lê hêj bersîva daxwaziyên wan nehatiye dayîn. Bo mînak îsal her ji bo vê meremê di nava xwe de îmza kom kirin, lê netenê bersîva wan nehate dayîn belkî berengarî êrîşên tund bûne û ji wan re hatibû ragehandin ku bi dubare kirina kareke han dê wan bi sûça têkdana asayiş û tenahiyê radestê hêza Întizamî bikin.




www.arsivakurdi.org

agiri

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**


**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php**

**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
**E - Mail:**
**rojnama_agiri@yahoo.com**
**agiri2003@hotmail.com**



# Em kiryara terorîstî ya kuştina Kanî Yîlmaz û Serdar Qazî mehkûm û şermezar dikin

Roja 22'ê Rêbendana 1384(11.02.2006)'an, şandeke Partiya Welatparêzên Demokrat a Bakûr ku Pêkhatibû ji **Kanî Yîlmaz**, Endamê Deftera Siyasî û Cihgirê Sekreterê Giştî yê PWD û **Serdar Qazî** naskirî bi **Sebrî**, Kadroyê siyasî yê PWD di kiryareke terorîstî li devera Silêmaniyê jiyana xwe ji dest dan.




Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê tevî mehkûm kirina vê kiryara terorîstî û şermezar kirina her kes û aliyekê ku bi meremên siyasî van terze cinayetane diafirînin, serexweşî û hevxemiyê ji malbatên birêzan: Kanî Yîlmaz û Kekê Sebrî dike û her wiha daxwazê ji Dezgehên Ewlekarî yên Hikûmeta Herêma Kurdistanê (Îdareya Silêmaniyê) dike ku encamderên vê kiryara terorîstî peyda û radestî edaletê bikin.

**Sekretariyeta Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**24.11.1384 (13.02.2006)**

# Peydakirin û talankirina çavkaniyeke kevirên biqîmet

Di vê midehê de kaneyeke kevirên biqîmet di gundê Sanîşan a devera Komasî ya Merîwanê de hate dîtin.

Talançiyên Komara Îslamî di zûtirîn demê de ew kevirane kirine Toz û di bin navê kevirê Barûtê de bi tirimbêlan ber bi bajarê Dilîcana Îsfehanê veguhastin û herwiha rayedarên rejîmê ji bo bêdeng kirina xelkê wî gundî dixwazin 5 ji sedê ya dahata firotina van keviran bidin wan.

Eva di halekê de ye ku dibe dahata



**Wêne: Kevirên dîrokî yên ZÊVIYE li Seqizê**

çavkaniyên binerd yên her welatekê di destpêkê, de ji bo vejandina aboriya wan deverane tê bikar anîn ku piraniya rûniştiyên wê kêmdahat in, ne ji aliyê karbidestên rejîmê bihê dizîn yan jî ji bo Parêzgeheke dewlemend weke Îsfehanê bihê veguhastin.

**Beşa Kurmancî ya malpera kurdistanmedia.com di demek nêzîk de dê babet û mijarên cuda cuda, wekî: nûçe, nivîsar, şîrove û wd... li ser rewşa gelê Kurd li Kurdistana Îranê di hemû waran de û her wiha zanyarî û agahî li dor siyaset û helwestên demokratîk yên PDK Îranê pêşkêşî we bike. Li benda me bin**

# Wexera dawî ya Pêşmergeyekî xebatkar yê PDK Îranê

Mixabin roja sêşemî 18'ê Rêbendana 1384'an ya Rojî(07.02.2006)'an yek ji Pêşmergeyên dilsoz û emegdar yê PDK Îranê bi navê **Mam Qadir Salihî** naskirî bi "Mame Qale" piştî çend mehan hevrikî tevî mirinê, bi egera nexweşiyeke neçareserkirî di Nexweşxaneya Azadiyê de canê xwe ji dest da û çû ber dilovaniya Xwedê û kul, kovan û doma rêya pir ji şanaziye partiya me ji hevçeperên xwe re bi cih hêla.



Mame Qale di sala 1316'an de li gundê Turkeman Kendî ya ser bi devera Ferhad Taş ya bajarê Bokanê di malbateke hejar û belengaz de hate dinê. Seba destkurtî û xizaniyê nekarî biçe xwendingehê û mijûlî karê çandiniyê bûye.

Mame Qale di Şoreşa Eylûlê de bi qasê 5 salan Pêşmergeyê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îraqê bûye û di sala 1358(1980)'an de hate nav refên xebatkarên PDK Îranê û di hêzên Beyan û Parêzgarî, Nexweşxane û Navenda 2 ya Kurdistanê de bi dilsozî û cangorîtiyê ve erkê pîroz yê Pêşmergayetiyê domandiye û li dehan şerên devera Bokan, Hewşar û Seqizê de bi çelengî pişikdarî kiriye.

Em wek Desteya Nivîskar ya Rojnameya Agirî behî û serxweşiya xwe pêşkêşî malbat û kes û karên Mam Qadir Salihî(Mame Qale), xelkê Bokanê û bi taybetî xelkê gundê Turkeman Kendiyê dikin û xwe di xem, keser û kovanên wan de pişikdar dizanin.

**Ruha wî her şad û hêviyên wî misoger bin**

# Çalakvana mafên mirovan û Jinan li Kurdistana Îranê, Dr. Roya Tilûî ji Kurdistanê revî

Dr. Roya Tilûî, çalakvana mafên Jinan û mafên mirovan li Kurdistana Îranê, di encama serhildana havîna îsal de li Sine hatibû girtin û qasê 66 rojan di bin îşkence yên hov û dirindane de bûye.

Piştî serbestberbûna wê xatûna çeleng ji girtîgeha reş ya Komara Îslamî bi dana pereyeke zaf wekî zemant, ji Kurdistanê revî û niha li derveyî welat dijî.

Agirî bi Dr. Royayê re hevpeyvîneke berfireh çê kiriye ku di hejmara tê (34)'an de dê were weşandin.



Li benda hevpeyvîna taybet di hejmara 34'an de ya Agirî bibin.

www.arsivakurdi.org